8- Şekirê çayê.. Yabo va te nan anî piştî rawestina çar demjimêran û tu hatî malê û serê te bilind e, tu pesnê xwe didî ji pêş xezala xwe ve ku te çi berxwedanî kir heya te ew nan anî. De ka keçiko pariyek nanî me deyne em bixwin û çayê çêke...
Xizalê: Çaya çi? Ma tu yê çayê tal vexwî!
Mêr: Çima! Nebêje şekir nîn e ?
Erê Wele nîne keko.. Bila Xizalê tiliya xwe bixe nav de.
9- Xwendin.. Kesên ku li zanîngehên Heleb û Şamê dixwendin, ji ber rewşa şer xwendina xwe rawestandin an jî dev jê berdan. keda 12 salan bi avê de çû.
10- Nexweşî û derman.. Yaw çi dibe bila bibe ya girîng saxlemiya me ye.. Ê ka ez ê çawa saxlem bimînim û derman nîn in, nêviyê bijîşkan jî bar kirine.
Kurdo, min ji te re deh sedemên delal rêz kirin ku hêlan tu li bayê bezê koç bikî. Hin sedem mane jî, lê bila di dil de bin...
-Yeke tenê...Sedemeke tenê dikare wan deh sedeman û bi hezaran mîna wan têk bibe...
Tu li welatê xwe wardar î, lê li welatê xelkê penaber î. Li Suriyeyê kurd bûyî, li Başûrê KURDISTAN'ê Sûrî bûyî û li Tirkiyeyê Suriyelî bûyî.
Penaberî ne çareserî ye .. bazdan jî ne ew e ... Çima tu yê bar bikî welatekî xweş, çima tu welatê xwe xweş nakî?
Landika zaroktiyê... ma te zaroktî li ku qedand, li ku derê te û hevalên xwe dilîst. Li ku derê tu li bin guhê erdê diketî.. Li ku derê tu evîndar bûyî.. Yekem car; ji ber keça kîjan welatî dilê te dest bi jenînê kir...
Te xwe li vir hişt û tu çûyî ku derê…?!!

Nêçîrvan Rojava

Kurdistan Dareke Bêber e

Dibe ku xelkek yan gelek bê welat hebe lê welatê bê gel wateya jinavçûna bi yekcarî ye, çimkî gelê bê welat hemû bizav û karînan bo bidestxistina wê armancê bi kar tîne û qurbaniyên mezin jî pêşkêş dike.
Ew hemû canbexşî bo bidestxistina hejmareke mezin ji mafan in mîna: rûmet,wekhevî,parastin û hin mafên din ta bi mafên xaneşîniyê...Lê eger mirov li ezmûnên çend parçeyên Kurdistanê baş temaşe bike ,bişopîne û li ser qadên wan bijî, mirov bi wê yekê bawer û bê guman dibe ku (KURDISTAN DAREKE BÊBER E)
Sedemên wê bêhêvîbûnê ..pir in , lê mirov dikare rohniyê bibe ser çend ezmûnên girîng ji Başûr, Rojava û ta radeyekê Bakur.
Gendelî û cûdahiya mezin di asta jiyana xelkê de, paşguhxistina hejmarek gelek ji xwedan qurbanî, hebûna hêzên serbazî yê taybet ji berpirsan re, her weha destdanîna ser rûberên berfereh ji zeviyên welêt taybet bo malbatên wan berpirsan , wan hemû tiştan dilên germ yên xortên Kurd sar kir û girêdana bi war ve di ramanên wî de sist kir.
Takeçare jî xakek e ku wî hembêz bike kiriye armanc û ew jî welatên dûr û sar in Ewrupa ye.
Rojava jî li ser rêbaza Başûr e eger xirabtir nebe, degelbûna alîyekî , gendelî, kesên ne guncaw di rêveberiyan de, serbaziya neçar, dubendî û dijberîyek bi bêbextî û birina xort û keçan bo şer li qadên biyanan ku xwedanê wan qadan dijminê bihîstina navê Kurd in , li hember jî tevgereke mirî ku kurtêlxuriyê , lavan,bazirganiyeke erzan dike , wan tiştên navburî ref û pêlên koçberiyê ber bi buhişta Ewrup ve pirtir kirin û
Ewrupa jî mirovan di nav xwede dihelîne:
Hemû maf Parastî bin , hêlên sor bo jiyana ciwanan tune bin, çarenivîs diyar be , ewlehî misoger be, dirav berdewam li ber dest be, mirov li gel xwedanê welat yê resen di heman astê de bijî û reftar bi yek pîvanê bi mirovan re bê kirin ....Tu kesek bîra vegera li welat nake ne niha û ne piştî çend salan ji ber dê her dû egeran deynin ser teraziwê û bê guman dê jiyana Ewrupa bi ser keve.
Belge jî li ser wê tekeziyê : Kîjan malbat ji dehan salên biyaniyê vegeryane welat..? Pir stranbêjên Kurd ku stran ji



Behzad Dawûd

(xwedê giravî) dilek bi şewat li ser mirina bi zindî li xerîbiyê distran, vegeryan ?? Na û nedihatin serdanekê jî , hereisa zarok jî roj bi roj di nava sîstema jiyana wan welatan de dihelin û êdî qet bîra vegera wî nifşî nekin.
Di dawiyê de mirov dikare bibêje ku çend deh kesayetiyan bo bercewendiyên xwe û xizmetkirina welatên herêmê ku dagirkirên me ne ew kesana tawanbar in û dê navên wan di rûpelên dîrokê de bi reş bêne nivîsandin.
Em milletek in pir ji Kurdistan biçûktir in ,ne hêja ne navê wê lewma ew jî xwe li me nake xwedan û dê bimîne Dareke bêber

Adara Keser û Serbilind

Meha Adarê meha gelê Kurd û Kurdistanê ye, meha ku ewqas êrîş , dagirkirî û kuştin tê de bi serê miletê Kurd ve hatine, ji komkujiyên kîmawî û binçavkirinên hovîtî û bidarvekirinên bê dilovanî bi armanca qirkirina me li her çar parçeyên Kurdistanê û bi daxwaza ku vê Bûhara xweş û geş li me bikin zivistaneke sar û zuha..
Meha ku her rojek ji rojên wê, bîranînek di hindirê xwe de hembêz kiriye, gelek kul û derdên me tên bibîranîn.
Ji 1'ê Adarê, sala 1979'an û bîranîna koça dawî ya serokê bi nav û deng Mella Mustefa Barzanî yê nemir e, heta roja 31'ê û bidarvekirina serokomarê Mehabadê Qazî Mihemed û sê hevalên wî di Meydan Çarçira de,li sala 1947'an.
Adara Serokê serhildana Agirî Îhsan Nûrî Paşa ku di roja 25'ê Adarê sala 1976'an de li Îranê bi qezayeke tarî va hate kuştin.
Meha zarok, jin û kalên Helepçe, ku di 16'ê Adara sala 1988'an de û bi destên rêjîma qirêj a Ba's rastî komkujiya kîmyawî hatin li Başûr û di encama wê de 5000 Kurd şehîd ketin ... Meha Ciwan û pakrewanên agirê Newrozê li bajarê Hesekê, ku xwe kirin mûmik û riya me bi ronahî kirin û nehiştin agirê Newrozê vemire... Meha stranbêjê bi nav û deng Bavê Felek ku di 9'ê mehê de xatir xwest û çû ber dilovaniya Xwedê û tenê bi dengê xwe û saza tembûra xwe di nav me de zindî ma.
Lê ne tenê ev meh meha keser û xemgînîyê ye, ev meh meha têkoşîn û azadiyê ye jî, meha serhildana Dêrsimê li dijî hovîtiya sîstema Turkiyê ye, û serhildana Qamişlo li dijî sîstema şofînî ya Surî di 12'ê Adara 2004'an de li bajarê Qamişlo û belavbûna wê li Kurdistanê bi tevahî û li gelek bajarên cîhanê yên mezin ku wek piştgiriyekê ji Qamişlo re daketin kolanan.
Meha şahî û serkeftinê ye, meha Newrozê û destpêka jiyaneke nû û bi rûmet e, ku bi berxwedana Kawayê Hesinkar li dijî zulm û zorê, agirê azadiyê bi jor ve hate hildan.
Meha Adarê meha ku çavên Kurdan tê de nayên girtin û ji rondikan zuha nabin.
Lê belê bi hêviya Adareke ku welat tê de azad be û yek perçe be.

Mustefa Mustefa

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Şerê Kilasîk

Ferîd Mîtanî

Mebest ji şerê kilasîk ew e ku hêzên fermî yên dewletekê li dij hêzên dewleteke din şerê hev û din dikin.
Mirovahiyê ev cureyê şer ji kevin ve nas kiriye û tevî borîna gelek serdeman li ser zayîna vî şerî, belam hê jî bingeha wê ya felsefî rastî tu guherînan nehatiye.
Ev cureyê şerî xwe dispêre çar hêmanên sereke ew jî stratecî, tektîk, pêşketina zanistî li gor dem û cihê, her wiha plan.
Lê ji aliyê konevanî ve ev şer şikandina vîna dijmin armanc digire.
Di dema îroyîn de tu guhertin di vî şerî de çênebûye ji bilî amadekariyên ku dema nûjen dixwaze mîna: amadekariya abûrî, civakî, konevanî û medyayî.
Hêmanên şerê kilasîk:
Wekî me got şerê kilasîk dabeş dibe li ser çar hêmanan: Stratecî, tektîk, pêşketina zanistî û plan.
Stratecî:
Ji strateciyê re tê gotin"Bikaranîna pevçûnê wekî navgînekê ji bo gihaştina armanca şer" yan jî "Hunera belavkirin û bikaranîna hemî amûrên şer yên leşkerî ji bo serkeftineke siyasî".
Her wiha tê gotin " Hunera bikaranîna hêzê ji bo gihaştina armanceke siyasî".
Gotina stratecî bi xwe Latînî ye, ji du kîteyan pêk tê "stra" tê wateya qadê(meydan) û "tig" tê wateya "çiya" û ev gotin her tim tê bikaranîn ji bo bingeh û prensîpên şer.
Prensîp û gerekiyên strateciyê:
Destpêk:
Destpêşxeriya ji bo kar di rêya rast de, di wateya kûr de destpêk li siyasetmedaran vedigere anku ew armancê diyar dikin, lê di warê leşkerî de bi fermandarên leşkerî ve girêdayî ye û ta ku armanc ji hemî aliyên xwe ve ji alîyê siyasetmedaran ve neyê zelalkirin, tu carî fermandar nikare rêya rast bişopîne.
Yekemîn gav ji bo destpêşxeriya kar: Ragirtina rewşê ye, anku fermandar hêza xwe û ya dijmin dinêre û baş dixwîne û xalên hêz û lawaziyê nas dike, ew jî bi alîkariya naskirina agahiyên derbarê hêz, cureyên çek, rengê perwerde û meznahiya hêza dijmin pêk tê.
Paşê hêza êrîşker li ser esasê perwerdeya dijmin û li gor rewşa seqa û xaknîgariyê tê amadekirin.
2- Rabezîn (Sprayz):Eger cehwerê destpêkê destpêşxerî be, cewherê rabezînê jî destpêşxerî ye lê bi şêweyekî ku dijmin texmîn neke.
Sprayz hêmana herî giring e di şer de, ji ber dema bi şêwazekî plankirî hêzek radibez ser dijminê xwe wê gavê hêza dijmin a manewî têk diçe û qordîneya dijmin ji leza re fer-

man û quralên şaş dide leşker, bi vê yekê bizav û zevera dijmin pûç dibe û bi dest xwe re tune dibe.
Rabezîn bi dem, cih û lezgîniya tevgera artêşê bi ser dikeve û divê ku li gor dem û cih planeke guncaw bête dayîn.
Ya herî pêwîst di rabezînê de razberî ye, anku bi rengekî sirrî birina êrîşê.
3-Sivkahiya lebatê: Sivikbûna lebatê di tewreya leşkerî de tê du wateyan: Ya yekê sivikbûna lebatê bi rengekî rast li gor cih û demê, ya duyan veguherîn û nermahiya keysbazî ber bi hemî aliyan ve.
Bê guman sivkahiya bi rengekî tekûz bi dest nakeve, lê bi asteke bilind dibe.
Ji bilî van gerekiyên jorîn çend prensîpên din yên strateciyê hene, yek ji wan" hêsanî" her çi qasî fermandar plan û strateciyeke hêsan û bênakok bibijêre, ew qas kêmasî kêm dibin.
Ya din "alîkarî", divê ku alîkarî di navbera hemî hêz û çekan de hebe çi hêzên bejayî, çi yên deryayî û çi yên asîmanî be, pêwîstiya wan bi alîkariyê di navbera hev û din de heye û divê hemî hêz li ser awazekî tevbigerin.
Helbet alîkariyeke tekûz çênabe eger hevrêzî (tensîq) nebe, ji vê yekê divê ku bi berdewamî agahî bi hûrgilî bêne nihartin di navbera hemî xalan de û ev yek bi hebûna odeyeke fermandariyê (qordîne) bi dest dikeve.
Tişta herî pêwîst di strateciyê de "aborandina di hêzê de" ye, ango nabe hemî hêza artêşê bi tevahî şiyan û karînên xwe yî mirovî ve tevlî şer bibe, divê ku hêza berevanî, palpiştî û yedek hebe.
Ji ber di tu şeran de encam nayên diyarkirin û ne jî dema şer, ji ber vê yekê divê fermandar bergiriyê ji hêza mirovî re bike û di cî de hemî artêşê neêxe di babelîska tevgerê de.
Divê ku moral neyê jibîrkirin, ji ber dibêjin guleya dijmin li şervanê mêrxas nakeve û di gelek şerên cîhanê de moralan kariye bi giraniya çekan.
Moraldayîn jî bi gelek şêweyan pêk tê, lê ya herî giring divê fermandar cihê baweriyê be li bal leşker û bandora xwe rastê

rast li wan bike, ji ber fermandar mînak e ji leşker re û her tim moral ji fermandarê baş tê girtin.
Tektîk:
Me giringîya strateciyê ji bo şer da diyarkirin û hat xuyakirin ku ji bî strateciyeke bi rêk û pêk serkeftin bi dest nakeve, belam ev stratecî divê bi tektîkeke baş di şer de were sêwirandin.
Mebest ji tektîkê ew e, hevsengiya di navbera barandina guleyan û şêwazê tevgera leşker de ye, anku sûd ji wê çekê bête girtin bi rêya tevgereke rast.
Ji tektîkê re du hêmanên sereke hene : barandina êgir û tevger. Em ê di du beşan de van her du hêmanan şîrove bikin.
Beşê Yekemîn:
Prensîpên barandina êgir:
Bikaranîna barandina êgir di şerên kilasîkî nûjen de xala herî sereke ye.
Di vê barandinê de divê hejmareke mezin ji avêştok û jêderên agir navendên sereke yên dijmin bikin nîşan. Her wiha xala lawaz di nîşanê de divê bi segvanî were nîşangirtin.
Her wiha divê danesera li ser dijmin bi rengê rabezîneke netexmînkirî bête kirin, da ku dijmin çekên dijêgir bi kar neîne.
Beşê duyemîn:
Prensîpên tevgerê:
Her çi qas hêz di qadê de liv û tevgerên cûr bi cûr dike, belam ev tevger bi tenê di çarçoveya êrîşkirin û berevaniyê de ye.
Her yek ji êrîş û berevaniyê xudana taybetiyên xweser in. Hêza êrîşker cih û dema şer destnîşan dike; hêza berevaniyê karînên xwendina deverê û amadkariyên endezyarî di destan de ye.
Pêşketina zanistî:
Pêşketina zanistî hêmaneke sereke ye di şer de nabe ku mirov piştguh bike.
Ji ber di demên kevin de afirandina kevanê û di sedsala 14'an de dîtina barûdê bandoreke ber bi çav kir.
Lê belê di roja îro de pêşketina çekan guherîneke mezin êxistiye di şêwazên şer de, bi çêkirina tang, top, tanzêr, firoke, mayîn; bi xebitandina peywendiyên têldengî û hêla enternêtê, êdî dûrbûn û astengiyên ku diketne pêşberî armancê de ji holê rabûn.
Plan:
Eger planeke leşkerî ya guncaw nehête danan, helbet tu nirx ji her sê hêmanên ku me destîşan kiriye re nîne.
Dema ku fermandar palna xwe didane, destpêkê van pirsan ji xwe dike û dibersivîne:
- Armanca sereke çi ye?
-Gelo karînên hêza min heye ku vê armancê bidest bixe?
-Şêwazê guncaw ji bo bidestxistina armancê çi ye?
-Piştî şerê leşkerî, rengê danûstandinan dê çawa be ?
Bersivdayîna van pirsên jorîn kilîta durist e ji danana her palnê re.
Bersiva pirsên borî xwe disipêre çend binyatên sereke:
1.Armanc:
Di dema îroyîn de hikûmet armancê destnîşan dike.
Berî ku hikûmet(desthilatdarî) armanca ji şer bi forma dawî diyar bike, nirxandineke bi hûrgilî li ser rewşa siyasî dike û xalên hêz û lawaziya xwe û dijmin digre dest.
Her çi qas armanca leşkerî li gor xwestekên siyasî were bidestxistin, dê ew qas serkeftineke nimûneyî bête bicihanîn.
2-Hêz (Wize):
Fîlozofê şer Karl Fon hin pêwîstiyan destnîşan dike ku peyda bibin dê mirov piştrast be ji karînên hêza xwe, ew jî ev in:
1.Divê hejmareke mezin ji leşkeran hebe da ku serkeftineke tekûz were bidestxistin.
2.Divê ev hêz amade be ku gelek qurbaniyan bide ta ku pîvanên hevsengiyê bi giranî bêxe ji para xwe.
3.Divê ku tevgera leşkerî û asîmenên siyasî bi êk ve girêdayî bin, da tu dijminine nû nebin asteng ji pêşveçûnan re.
3-Şêwaz:
Piştî ku fermandar armanca xwe nas dike û ji hêza xwe piştrast dibe, êdî şêwazekî guncaw ji bo şerî destnîşan dike.
Destnîşankirina şêwaz jî girêdayî çend xalan e: dem, karîn û xwezaya qada operasyonan.
1.Dem:
Mebest ji demê ne ku çendaniya dema ku di operasyonan de ye; belam mebest jê dema çavdêrî û bendewariya berî şer e.
Hêza ku dijberên wê qonaxa bendewariya êrîşekê jiyan dikin, divê ku ew hêz pêşbaz be û di cî de êrîşê bibe ser dijminê xwe.
Her çi qas di şerî de têk biçe jî, lê çêtir e ji ber ku çi qas dijminê te di bendewariya êrîşê de bimîne dê ew qas ziyanê bigihîne te.
2.Karîn:
Dema artêş xudana hêz û karîn be ji aliyê leşkerî û siyasî ve, divê destpêşxeriya şer bike.
Ji ber dema hêza artêşê ne tekûz be tu carî nikare navendên leşkerî û siyasî yên dijmin desteser bike.
3-Xwezaya qada operasyonan:
Mebest ji qada operasyonan ew cihê ku şer dê lê were kirin.
Divê ku qada şer bi hûrbînî bête xwendin û li gor reng û xwezaya wê tevgera leşker bête eyarkirin, her wiha dem û karîn jî bandora xwe li tevgerê dikin di qadê de.

Kurd Çima Tên Xapandin??

Kurd her xwe dixapînin û ji aliyê dijmin û partiyên xwe ve tên xapandin.. ÇİMA?
Hewl didim bersiva vê pirsa kambax bibînim. Bo dîtina bersivan, min çend pirs ji xwe kirin:
– Kî bêhtir dixape di nav malbatekê de?
bersiv: Zarokên wê malbatê –
Çima zarok bêhtir dihatin xapandin?
bersiv: Pir sedemên wê hene lê yên tên hişê min; tecrûbeya wan di jiyanê de nebû, texmîn nedikirin malbatên wan ku xwediyên wan bûn wan bixapîne tew belkî ji baweriya bêsînor bi dê û bavan bû.. yan tew belkî hebûna kesekî wek ”serok/birêvebir”ê malbatê û pejirandina ku ew kes xwediyê her biryar û zanebûnê ye û divê neyê munaqeşekirin bûbe sedem ku zarok zûtir û hêsantir bên xapandin.
Helbet mijara me ne xapandina zarokan e, belê di baweriya min de kêşe û nexweşî ji wir destpê dike min wiha dest bi mijarê jî kir.
Piştî ez ji gund çûm Amûdê bo dibstana xwe berdewam bikim, li bajêr pir caran hatim xapandin tev ku ez xwendekarekî zîrek bûm. Lê tecrûbeya zarokên bajar û nasîna gelek cûreyên mirovan her dihişt ew ji min zîrektir bin. Belê vê rewşê dom nekir ji ber piştî demekê ez jî bûm xwedan wan tecrûbeyan û êdî min dikarîbû xwe biparêzim.
Ev rewş ne ji bo zarokan tenê rast bû, belê ji bo mezinan jî wisa bû. Çi gundî bihataya bajêr firoşker û esnafên bajêr hewl didan wan bixapînin û ji xwe pirê caran dixapandin. Ji vê mirov fam dike ku kêmtecrûbe û nezanî sedemek guncaw e bo xapandinê.. Dîsa vegerin ser rewşa bajêr û gund û bi hev bipîvin, dê bibînin ku gundî baweriya xwe bi axayê xwe yan muxtarê xwe hebû û bi êl û eşîra xwe ve girêdayî bû. Bi gotinek din, hinek hebûn ji dêvla wî bifikire û biryarê bide. Belê mirovên bajêr bêhtir azad bûn ji wan, tev ku ew jî bi şêweyek din girêdayî tiştin din bûn li herêmên me. Ku em vê rewşê bi sedên salan bidin ber çavan li nav kurdan, belkî em bikaribin bibêjin ku em hînî hebûna şivanekî, rêberekî, axayekî bibûn û ev jî bi dewra xwe em hîn kiribûn ku bi şexsetiya xwe ne bawer bin û nizanibin biryar û qerarên xwe bistînin. Herwiha baweriya bi dînên wek îslamê û baweriya ku Xwedê heye û her tiştî dizane û dibîne û herwiha belavbûna mele û şêxên virker û derewçîn jî bû sebeb ku şexsiyet û kesayeta me li paş bimîne û em ji xwe nebawer bin û tirsonek bin jî.

Mihemed Xêr Şêxo

Helbet sedemên dî jî hene bo vê nexweşiya me, lê bi min sedemên ku hebin jî ji cehalet û nexwendebûna me bû.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Serpêhatî

Dîroka Gundê Hemzebegê

Zubêr Zênal

Cihê Bav û Bapîran

Zirrekan, topraxeke fireh e. Di navbera parêzgeha Hisîça û bajarê Serê Kanîyê de ye. Sê çemên avê tê re derbas dibin.
Berê ew toprax havîngeha êl û koçerên Zirrekan bû. Ji ber ku ew toprax hê bi navê e'şîra Zirrekan tête gotin, û çiyayê Ebdul-Ezîzê buhargeha wan bû. Ji ber ku heya aniha hin dever hene di çiyayê Ebdul-Ezîzê de hîn bi navê wan tête gotin, wek "Fêde Sînekan û Bîrê Sîpkan" .
Di wê çaxê de, yekî Zirrekî û yekî Êzîdî ji Çiyayê Şengalê destbirakê hev bûn. rojekê, yê Êzîdî li cem ê Zirrekî bû mêvan, rabû berxek jê re serjê kir. Piştî firavîna xwe xwar, rabû hinek Qizwan kire sêniyê û li ber danî, ji ber ku êmîşê çiyayê Ebdul-Ezîzê Qizwan tenê bû .
Yê Êzîdî çend lib xwarin û rabû ser xwe ji yê Zirrekî re got: Bira, dixwazim tu rojekê bê mêvanê min. Piştî çend rojan, ê Zirrekî rabû çû cem destbirakê xwe li Çiyayê Şengalê .
Ê Êzîdî jî berxek serjê kir, piştî yê Zirrekî firavîna xwe xwar. Yê Êzîdî rabû ser xwe sênîyek ji Hejîrê Çiyayê Şengalê yê bi nav û deng li ber danî. Piştî yê Zirrekî hinek xwar, yê Êzîdî jê pirsî û got: Bira, Çiyayê Şengalê xweş e yan ê Ebdul-Ezîzê?
Yê Zirrekî lê vegerand û got:
" Cihê bav û bapîra Qizwan xweştir in ji Hejîra " .

Gundê Hemzebegê li herêma Dêrikê li başûrî çiyayê Qereçûx pêşberî dara Keçika Kezî dikeve. Ev çiya ne gelek ji rûyê zemînê bilind e û ne gelek dirêj e, ji hêla rojhilat ve, ji Kaniya Dirêj dest pê dike ta digihe Omer Tewîlê di navbera gundê Xana Serê li ser rê û gundê Mêrga Mîra de dikeve.
Gund bi navê Hemzebegê Şikakî hatiye binavkirin lê Hemzebegê Şikakî kengî li vî Gundî daniye û kengî jê bar kiriye kes ji Gundiyan vê yekê nizane, tenê şûna konê Hemzebegê Şikakî hîn xuya dike, dibêjin di demekê ji deman de Nayîfê paşê konê xwe biriye li ciyê konê Hemzebegê Şikakî daniye lê konê Nayîf ne bi qasî konê Hemzebeg derketiye.
Dema ku Nayîf dibîne konê wî ne bi qasî yê Hemzebege ji xulamê xwe re dibêje konê min rakin ez ne bi qasî vî mirovî me ta ku ez konê xwe li ciyê konê wî deynim.
Gundê Hemzebegê li cîyekî niviz de hatiye avakirin, di nîvê gund de wek hêrekî ji wê tevî nîn e. Ew newal hinekî ji Gundê Hemzebegê dûr e ev her dû newal li hêla rojhilatî gund dikevin.
Li başûrî Gund du gir hene yek jê navê wî Girê Girxerdel e .Xuya dike di demekê ji demên dîrokê ve, ev gir hatiye avakirin ji ber ku gelek qehfik tê de hene û axa wê wek tifikê ye. Girê Girxerdel hinekî bilind e, di buharan de mirov nikare here serê Gir hingî gelaş û sitirî li serê gir û dora gir çê dibin. Girê dî jê re dibêjin, Girê Hesenê Îso lê ev gir ne gelekî lewma Nayîf ji zarokên xwe re gotibû dema ez mirim min li bin wê darê veşêrin. Jixwe di demekê ji deman de Nayîf û Erebên Şemeran bi hev re şer kirine hin dibêjin Nayîf ji lewma xwestiye ku gora wî li pêşberî wan Ereban be ji ber ku Erebê Şemer li başûrê çiyê dikevin ta bi sînorê Iraqê.. Lê mixabin îro ew çiya hemî bûne bîrê Betrolê, lê tiştê baş ew e, ku ji sala 1999'an ve, hikumetê dest bi çandina daran li dorman dora çiyê kiriye, û aniha hin ji wan daran baş mezin bûne, ji ber ku hikumet nahêle sewal here çiyê û wan daran bixwe.
Lê ka em vegerin ser wan ciyê ku me got yek jê av e, tehil, ev kanîk bû ava wê diherikî ta berî çend salan lê ava wê nedihate vexwarin tehl bû û mirov nikarîbû wê vexwe lê îro ew av jî nemaye, kanî çikyaye. Yadî Kaniya Şerabiya ava wê tim diherikî û xurt bû lê îro ava wê jî kêm bûye û ez bawer im ku salinan ava wê diçike.
Li hêla rojavayî Kaniya Şerabiya gorek hebû jê re digotin gora Seyd Mehmûd, xelkên wan Gundan digotin ev Ocax e û tim paçikê kesk pê ve dikirin lê di van salên dawî de, hinan ew gor vekiriye hin dibêjin ew xizîne bû û yên ku hatin vekirin Asayîşên Sûrî bûn. Ya dî Kaniya Keçikê, ew hîn ava wê heye û ava wê gelek xweş e. Tehteke dî li bakurê gund heye jê re dibejin Tehta Conî, bi rastî jî ew teht wek conîkî tê de heye, ew coniyê ku xelkê di dema berê de, danê xwe tê de dikutan. Û du kaniyên avê li her dû kêlekên Gund hebûn, yek jê re digotin:
Kaniya Jinan ew li rojhilatî Gund bû pîrekên Gund ava xwe ya vexwarinê ji wê kaniyê tanîn, ew bi gund ve bû û ava wê kaniyê gelek xweş bû û nexasim ji çayê re, ava wê ji tehtê derdiket. Ya dî jê re digotin Kaniya Mêra, ji ber ku berê zilamên gund sibihan zû diçûn li ser wê kaniyê xwe dişûştin û pêktanîn û hinan li ser kaniyê nimêja xwe jî dikir. Ew kanî bi hostayî bi kevirên reş hatibû reqifandin, ava wê diherikî û masî jî tê de hebûn û hin kevirên pehin jî li dora wê danîbûn da ku mirov li ser wan nimêj bike, lê mixabin îro ev her dû kanî ziwa bûne, gundê Hemzebegê yê Nayîfê Paşê bû ji lewma carinan dima bê muxtar û carinan jî muxtarê wan hebû. Ji ber ku dema ew ji yê muxtar dixeydî diberdayê ji muxtariyê. Li gor ku ji min re hatiye gotin di wê demê de Nayîf gelek zilm û zor li Hemzebegiyan dikir ji lewma jî dema ku hikumetê erd li xelkê belav kir Gundiyan bi yekîtiya xwe, erd ji xwe re jê standine û Hemzebeg Gundê yekimîn bû ku di wê demê de, erd ji Nayîf sitandiye, lê wek hemî axa û begên kurdan Nayîf jî gelek zilim û zor li xelkên Hemzebegê dikir.
Xulamekî wî hebû jê re digotin Hisênê Emer. Dema ku karê Nayîf bi Hemzebegiyan çêdibû ji Hisênê Emer re digot here bila Hemzebegî werin filan karî bikin. Dema ku Hisênê Emeran dihat û digiha serê wê mila newala Besta Xedîra bang li gundiyan dikir û ji wan re wisa digot: Hemzbegîno rabin fecir ji we bihûrî rabin fecir ji we bihûrî.. Di dema palehiyê de Nayîf dişande ji gundiyan re û di buharan de ji wan re digot werin mişk ketine nav zadên me herin qulê mişkan şehir bikin û bigrin. Gelek caran ji Hemzebegê re digotin Himamok. Dema ku karekî Nayîf bi gundiyan çêdibû xulamê xwe dişande gund û jê re digot: Here Himamokiyan bîne. Wê yê xulam berê xwe bida gund, lê beriya ku ew bigiha gund wê bang kiriba Himamokîno fecir ji we bihûrî rabin ser xwe, ta ku yê xulam digiha gund, wek eskerê bikeve amediyê de, gundî hemî ji malên xwe derdiketin ta ku xulamê Nayîf digiha cem wan, wê ji wan re bigota:
Nayîf gotiye ber herin qulê mişkan li nav erdên min bigrin, an ber herin paleyê û bi vî rengî çi karên hebana, Nayîf xulamên xwe dişandin pey zilamên Hemzebegiyan.
Nayîf ta bi rûn, hêk û tepikan ji xelkên Hemzebegê distandin.
Yek ji zilma wî ev bû. Carekî kurê Mehmûdê Emo miribû bi nexweşiya sorikan, Mehmûd ji xelkên Hemzebgê ye, gundî hemî li ser goran in, dê wî tifalî veşêrin, gundiyan haj xwe nîne dîtina wan dîtî xulamê Nayîf di nav wan de sekinî, yê xulam ji gundiyan re got kuro Hemzebegîno bê ku bêje serê we sax be yan li ber dilê xwediyê mirî bide, Nayîf gotiye bila werin qulê mişkan bigrin, mişkan genimê me hemî xwar.
Gundiyan lê meyzand li termê pêşiya xwe meyzandin jê re gotin: Em ê vî zarokî veşêrin û em ê werin.
Yê xulam got: Na divê niha hûn bi min re werin bila pîrek veşêrin. Gundî newêrin pê re dirêj bikin, dane pey wî çûn nav genimê Nayîf da qulê mişkan bigrin û nema mişk genim bixwin. Pîrekan ew zarok binax kir.

Luqman silêman

Hemzebegê Şikakî hîn li serê girê Hemzebegê xuya dike. Gundên li derdora Hemzebegê ev in:
Li hêla rojhilat, jê re dibejin Malê Newaf ew gund yên kurê Nayîfê Koçer in û li başûrî Malê Newaf jê re dibejin gundê Teyan, ew jî beşek ji koçeran e. Li başûrê vî gundî Tilxenzîrê Piçûk û yê Mezin hene. Li hêla rojava gundek heye jê re di bêjin Besta Sûs. Li hêla rojhilat û bakur gundê Nayîfê Paşê heye, li, quntara çiyê dikeve.
Di dema berê de Hemzebegê û ew gundên wê derdorê hemî yên Nayîfê Paşê bûn, Nayîf mezinê êla Koçeran e.

Li hêla rojavayî Gundê Hemzebegê newalek heye jê re dibejin Eyşbetal, li newala Eyşbetalê ji hêla başûr ve hin kevir û şikêr hene, lê ji hêla bakur ve latên mezin û tehtin mezin hene. Dema ku mirov diçe nav wan, hinek tirs bi mirov re çêdibe, yanî di dema berê de, carne kalemêrê gund digotin cin li Eyşbetalê hene, lê tucarî kesî nedigot va min cinek li newala Eyşbetalê dîtiye.

Girê Hemzebegê bihtir ji pêncsed mitran dirêj e, ji pêşiya gund û bi başûr ve diçe, ji rexê gund ve serîyek e, lê ji rexê başûr ve dibe du serî û her dû serî ne wek hev in, seriyê hêla rojava bilindtir e ji seriyê hêla rojhilat, lewra xelkên Gund miriyê xwe li wir vedişêrin, kirine (goristana gund).Li başûrî her dû seriyan ciyê konê tehta nerim heye, xuya dike berê ciyê mezelên xwediyên wî gundî bû, ji ber ku hîn gor tê de hene, hin ji gundiyan dibêjin ev gund di kûrahiya dîrokê de Mosûsanan tê de bûn (Êzîdî) û ev gor yên wan in, lê hinên dî dibêjin na, ev gund yê Hemzebegê Şikakî bû, ne tenê ev gund lê hin gundên dî li bakurî kurdistanê bi navê Hemzebegê Şikakî hene û yek jî li Kurdistana Iraqê heye, wek ku tê gotin: Hemzebegê Şikakî ew serokê eşîra Şikakan e û di dema berê de Kurd kêm li bajaran rûdiniştin û sînor wek îro di nava Kurdistanê de nebûn ji lewma Hemzebegê Şikakî li gor demên salê li nava Kurdistanê digeriya, ji bo sermê û germê yan ji bo çêra sewalên xwe . Ji vê yekê hin dibêjin çi ciyê ku Hemzebegê Şikakî konê xwe lê daniye ew der maye bi navê wî.
Îro pêncî û neh mal di Gundê Hemzebegê de hene ji wan, çar mal bê nasname ne û şîniyên gund tev çarsed û sî û sê mirov in.
Bîst û şeş malan ji Gund bar kiriye hin ji wan çûne Şamê, hin çûne Qamişlo û hin jî çûne Dêrikê, bê guman ev tev ji bo rewşa abûrî koçber bûne û bi deriyan ketine, hijmareke berbiçav ji xwendevanan di gund de hene.
Li hêla Rojhilatî Gundê Hemzebegê, du newal hene her dû newal navê wan ev in: Besta Xedîra û newala dî jê re dibejin Newala Goza, ew newal gelek lat, şikêr û tehit tê de hene, lê çima navê wê bûye Newala Goza, ez nizanim, tevlî ku yek dara gozan li wê deverê ji erdê bilind e lewma îro ew tê çandin û terektor dikarin lê cot bikin, ew jî wek ê dî qafik lê hene xuya dike ev gir jî di dema bûrî de hatiye avakirin ji lewma dema ku mirov axa wî dide hev qafik tê de derdikevin xuya ye ku ev şûnwarê bav û kalên me ne.
Li hêla rojavayî Gundê Hemzebegê newalek heye jê re dibejin Eyşbetal, li newala Eyşbetalê ji hêla başûr ve hin kevir û şikêr hene, lê ji hêla bakur ve lat û tehtên mezin hene. Dema ku mirov diçe nav wan, hinek tirs bi mirov re çêdibe, yanî di dema berê de, carnan kalemêrê gund digotin cin li Eyşbetalê hene, lê tu carî kesî nedigot va min cinek li newala Eyşbetalê dîtiye.
Li hêla bakurî Gundê Hemzebegê hin ciyên dî hene wek; Çil Kanîk, Çil Kanîk di dema bûrî de kesî nedikarî tê re here, hemî qeram û çîtik bûn, û avzanik bûn û Kaniya Keçikê û Kaniya Şerebiya û av e, Tehlê û Gêç. Li hêla rojava li serê çiyê Dara Keçikê heye ew jî çîrokek wê ya dîrokî di dîroka wê deverê de heye, ji Dara Keçikê û başûr de Dara Kurikê Rewal heye. Bajarê Kurik
û Dara Kurikê Rewal, ev her dû dikevin pişta çiyê, ew ji gundê Hemzebegê ve xuya nakin.
Gora Nayifê Koçer li ber Dara Keçikê hatiye çêkirin, dema ku mirov li binê darê disekine û li dora xwe dinêre, nexasim li hêla başûr ta çavê mirov difitirine mirov dibîne, ji ber ku di wê hêlê de cî ji wî cî bilintir nîn in û pêşiya çiyê ji hêla başûr ve deşteke rast e(Erdekî rast e)ji

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî... Ferhadê Içmo

di sala 1960î de li bajarê Qamişlo hatiye dinyayê, li dibistanên bajaêr xwendina xwe bi dûmahî aniye. Di sala 1984an de bawernameya-BEKE-LORYOS – di endazyariya şaristaniyê de ji zankoya Helebê wergirtiye.

HHEWARA...DIL...

Ger bi xweşyê , rojê jînê, bêne pîvan
bi awaza , bi dîtina , sor nêrgizan
bi helbesta , bi seyrana, bi nû cejna
bi tewafa , dêm û xalên , zirav bejna
jiyana min , tev tarîye, wek şeva reş
maye hisret di sînga min,rojek rûgeş

tim dinalim , di şikefta ,wekî Ferhad
şêrîna min ,di bin desta , dikî firyad

xweşyê barkir ji warê min bê poşmanî
konê êşa , li min vegirt , bi giranî

saz û helbest tevde revyan ji nav têla
lehya xwînê gul û nêrgiz dan ber pêla

seyran û cejn mane xwînî dernakevin
di şikefta , mane winda , ranakevin

êşa mezin , kula giran , xwedya xala
dike hewar , li min îro , di newala

kerwanê wê ji hev gerya bû sed perçe
ma wê çima, gur û rovî ,neyên bexçe

hewara dil,her xwebighîn,şahê kerwan
êş û sawêr , ji çar alya , li min civyan

hewara dil , ev ne jîne , ev ne jîne
here bi lez , peçê kerwan , li hev bîne

ger em nejin , ji bo çavên , ziravbejnê
wê tim xûzbe , ber bi jêrde , ala cejnê.

6.2.1988

PEQPEQOKÊN BIHARÎ

Piştî peqpeqokên biharê
bi ser avê dikevin .
bê dadiya mirovan,
bawer ...
nakin ....
û yekser diteqin .... !!!
2 – 10 – 1998

ROJ

RRRoojjêên me ,
û salên xelkê,
li kêleka hevdû ,
sekinîn.....!!!
roja xwe xûzkir,
da ku ..
serê sala ..
maçîkin .....!!!

2 – 10 – 1998

GAZIN

Dema
tu derbasbe dilê min.
guh ned ,
gazinên xelkê.....
lê.. dema ,
tu ji dilê min derkeve.
ez guh nadim,
bazinên ..te .....!!!

1- 10 – 1998

berî helbestê, dil ketiye mûzîkê û di sala 1970ê de dest bi lêdana Tembûr û Gîtar û Cumbişê kiriye . di 29.07.1978 an de helbesta yekemîn bi navê – EY ZEMAN- daniye. nêzîka şêst helbestên wî bûne sitiranî bi dengê: Mihemed Şêxo - Beha Şêxo – Adil Hiznî - Selah OSê – Isma'îl Cuma – Gulistan Sobarî – Şeyda- Sefqan , I'itîdal , Ronî can, Hozan Derwîş, Îmad Kakilo, Seed Ferso

PELÊ SIPÎ

Piştî ku pelê sipî,
ji bêrîka min ,
derxistin .....
ji min re gotin:
heger pel ne sipî ba,
wê tawana te,
siviktir ba ...!?

2 – 10 – 1998

GIRÎ

Dema..... zarokek ,
bi kurdî .. digrî ,
dijjjjmin....
bi " ...., ...û ...., " î sixêfa dike.
5 – 10 – 1998

MAYÎN

Her mayînek diteqe.
hêviyek,
li jiyanê,
di çillmise .

8 – 10 – 1998

GAZINA NEKIN

Gazina .... nekin.
bi tilîyên min , xara ..... ranekin.
berê ji êşa ,
berê ji kulla ,
ji daxên kevnar , tilî .....belekin.
kulên di dil de , li hevdû civyan,
berî omîd bên ,
berî rok hilê , hêvî tev revyan,
hêsir û birîn ,
kovan û nalîn ,
li ser sînga min , rist û ..xelekin.
hûn bi xwedê kin ,
birîna kevnar , dîsa ..... venekin.
tiştê ez zanim ,
tiştê min naskir ,
rojên jiyanê , vir û henekin.!

20 – 12 – 1995

NE EZ TENÊ

Ne ez tenê .....
evîndarê çavên te me .....
di nav pencê destê mirnê .
ne ez tenê ,
pesindarê lêvên teme .....
di zindana reş û sar de ,
di nav pêtên ag'rê har de ,
ne ez tenê ,
hêv'ya roj û şevên teme ...
ey Dîlbera jar .....,
sîh hezar hezar ,
mane dîl û jar ,
li pey navê te,bûne evîndar,
ne ez tenê ,
teşî rêsê , lavên te me .....
ne ez tenê ,
nêçîra nav davên te me .....
ne ez tenê ,
evîndarê çavên te me .....
28 – 8 – 1996

DAXÊN...EVÎNÊ

Ê bi daxên,evîna dil,bête sotin
rizgar nabe , li vê jînê , ji xeyala
ne her peyva,li civata.ku tê gotin
dibe tacek , li ser serê , xort û kala
hîn ji çava.wek cobara,hêsir cotin
em bûn lîzkek,di nav destê,meh û sala
hêsrên yara,li meyxana,tên firotin
kes têr nabe, ji helbestên , wan peyala
* * *
her hêstirek,li ezmana,bû sitêrek
lê tu heyve , li nav ewrê , wan sitêra
her rondikek,di dil min de,bû birînek
bû nalînek , ji dor xaçê , li ser dêra
yar ji kesî,bi dirava,nayê kirîn
yar tê xwestin ,bi rewanê,gênc û mêra
ê bitirse , ji birînêt , pîj û xara
li gulzara , naghê gula , nav şilêra
* * *
dilê riswa,bi birîna,xweş xemilî
jan gihaye , ew omîda , di hinava
meh û sala,bi siwarî,dane pey hev
em têr nebûn , ji dîtina , herdû çava
me evîna ,herdû dila,daye destê
payîzoka , di nav pêlên , qîr û lava
jîneka dî,ji xwenên xwe,me peydakir
gul xemilîn , bi rondikên , bûk û zava
* * *

bêyî rewşa,xemla dêmê,gula şermîn
kî nasdike , zivistana , ji bihara
pakrewane,ê bê kuştin,bi mêranî
li vê jînê , di hembêza , dost û yara
k ê l ê n gora,şermezarin,gunehkarin
bi qêrînin , bi hewarin , her êvara
bera axa,goristana,tenê bêje
ez dibhîzim , nalenala , evîndara
* * *
14-1-1994





WERZÊN EVÎNÊ

Min tu naskir
dema ku ewrekî rêbar
di singa ezman de digiriya ...
min bêriya te kir
çaxa ku bilbilekî evîndar
di nav
Nêrgiz û Nesrînan de difirya...
min ji bêrîkirinê hewarkir
gava ku gundiyekî xewar
bi ser kaya bênderê de diboriya...
min pêjna te kir
piştî ku zîzbûneke sar
di hêlîna
hechecîkê de dizûriya...
12 – 11 – 03

heta niha heft pirtûkên helbesta çapkirine:
1- Lêmişta Zozanan 1988
2- Piştî çi 1995
3- Evîna Te 1998
4- Landik "1" 1998
5- Pelên Spî 2000
6 – Landik "2" 2001
7- Qêrîna Yekemîn 2006

EVÎN

Tenê .... evîn ...
kare bihêle
ku evîndarên rêwî
li hev dû vegerin
û ...
ewrên kînê
ji ezmanê perweriyê
barkin …
04 – 2 – 03

DIL

Li welatê evînê
dilê te
Ûtêlek bê sitêre
û li ser ...
çiyayê Cûdî
dilê min
xanîkî biçûke
pirtikên berfê dijmêre ...
16 – 2 – 03

KOLAN

Di kolanên dilê min de
li hêviya berbanga evînê
rêbarekî bê zar
her êvar dihêwire ...
li dor pêtên wî
sînga min gulav dide
û laşê min disincire ...
nizanim çawa
rekeha sînga min diçirrîne ,
û peyala xwe
ji nalînên min dadigire ...

10 – 11 – 04

Ji berî salekê de nexweşiyê xwe berdaye laşê wî, lê bi vîneke xurt, û bi hêzeke helbestî di ber xwe de dide, û himber vê nexweşiyê radiweste û hîn berdewam e.

Esker

Esker Esker tû tî
çakêt ne dirûtî
zikê wî tim dêşe
ji xwarna necûtî

Esker bi tivinge
bê mejî û linge
xwezya zikê esker
Dîkê li ser tinge
Esker tê ji bajêr
ji bo mast û penêr
bextê xwe difroşe
diza dike camêr

Esker ser bi kume
li gund gume gume
hespê Esker pîse
çi zû dilikume

hatin Esker hatin
bêrîk bê xelatin
hîn gundî dibêjin
Eskerê Welatin

27-12-1998

Kurdi Xwesh e

Şêwirmend	مستشار
Raperîn	انتفاضة_قفزة
Amar	احصاء
Rikberî	معارضة
Azwerî	طموح
Rûdêm	ملامح
Perwer	مخلص
Dilteng	غيور
Avjenî	سباحة
Vedîtin	اكتشاف



Gotinên Pêşiyan

- Erzan kirî, heban dirî.
- Giya di bin kevir de namîne.
- Destê çikûsan dirêj e.
- Havîn xweş e li bin siha daran.
- Axîna kûr ji dilê kul tê.
- Rû ji rû şerm dike.
- Şîret li dînan nabin.
- Kilîta dev parî ye.
- Dilê fireh pîr nabe.
- Bila avis be bila dereng be.

Seyrana Kîsoyan

Carekê komek ji reqan(Kîso) haziriyên xwe kirin û çûn geşt û seyranê.
Berê xwe dan cihekê ji bo geşta xwe lê bikin.
600 salan di rê de man ta gihan cihê xwe..
Bû dema xwarinê, dîtin ku xwê ji bîr kiriye.
Yêkî ji wan got ez ê herim xwê bînim.
600 sal li ser çûna wî re qediya reqan got em ê xwarina xwe bixwin.
Reqa ku çûyî xwê , serê xwe ji ber darê derxist û got: Ez hîn neçûme, min xwe li vir veşartibû ji ber min dizanî hûn ê xiyanetê bi min re bikin.

Pirsname

Peymana Qesra Şirîn di kîjan salê de bû?

Şerê Çaldîranê di navbera kê û kê de bû?

Peyva Wendayî

çinar, bav, kur, keç, mam, xal, Mamik, sivik, candar, pismam, bapîr, bira, xwîşk.
Peyva wendayî: ji 7 tîpan e, merivê ji malbatê.

Mamik

Tiştek heye: reş e, reş e wek qîr
sipî ye wek şîr,
Çêdike kûtlikê jina mîr.
ew çi ye?

Şaşik li ser sera ye
Dixwîne ne mela ye.
çi ye?

Zûbêj

Heft baq derzî, derzî derzî, di qula derziya cîrana me re bezî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	D	Ç	I	N	A	R	C	M
2	O	B	K	X	M	K	A	A
3	T	I	U	A	V	E	N	M
4	M	R	R	L	A	Ç	D	R
5	A	A	A	L	B	B	A	Î
6	M	X	W	Î	Ş	K	R	P
7	P	I	S	M	A	M	A	A
8	S	I	V	I	K	T	Î	B

J Serpêhatiyên Kuradn... xurme

Seydayê Tîrêj Lawikekî li cem melakê Quran dixwend. Her sibeh diya wî çend lib xurme didanê û diçû xwendinê. Xurmên lawik neman, lawik xeyidî û got: Divê hûn xurman ji min re peyda bikin. Çi sibeha hebû, lawik bê şer ji bo xurman nediçû xwendinê. Rojekê diya wî hat cem mele û jê re got:Seyda, xurmên me neman, her sibeh lawik bi me re ji bo xurman şer dike , ez hêvî dikim ku tu wî qani' bike , ji bo ku xurman ji me nexwaze. -Seyda got: Xem nake , piştî mehek dî ez ê wî qani! bikim. Meha lawik qedya bi vî karî . Lê piştî wê mehê nema xurme xwest. Diya lawik hat cem mele gotê: Seyda, ez dixwazim tu bêjî çima piştî mehekê te ji layê min re got ?.
-Seyda kenya û gote jinkê: Xuşkê , ez jî wek kurê te min tim xurme dixwar, xurmên min jî neman, min tim bi kurê xwe re şer dikir ji bo ku xurman ji min re bîne , lê dema ku tu hat û gilîyê layê xwe te bi min kir, ji wê rojê de min terka xurman kir, piştî mehekê min nû ji layê te re got , ji bo gotina min tasîrê li lawê te bike, lê dema ku min jî xurme bixwarina, gotina min bi serê layê te de nediçû .